Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1285 | 29-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Lebatên laşê mirov

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Laşê mirov ji şane, tevin, lebat û pergalan pêk tê. Di giştî laşê mirov de 78 lebatên hene û ji wan 5 yên herî girîn in. Lebatên laş ji tevnan pêk tê û pergalên laş pêk tîne. Her lebatek ku xwedî erkeke cudayî, avahiya laşê mirov temsîl dike.**

Lebatên laş avahiyên wê temsîl dikin ku ji komek tevnên ji bo pêkanîna erkekî taybetî bi hev re hatine berhevkirin, pêk tên. Her komek lebatên laş ji bo avakirina pergalekê tên cem hev û hejmara van lebatan di laşê mirov de digihîje 78'an. Di nav wan de 5 lebatên herî girîng hene ku herî zêde werin parastin. Ev dikare bi şopandina sîstema xwarinê ya baş ku hemî pêwîstiyên ku laş hewce dike dihewîne, herwiha bikaranîna werzîşê û pejirandina şêwazê jiyaneke bi tendurist, were bidestxistin.

### Lebatên laşê mirov

Lebatên laş ji beşan pêk tê, her beşek xwedî erkekî taybet e ew jî li gorî cihê ku ew lê ye. Hin ji wan ji bo belavkirin xwînê û yên din jî ji bo helandina xwarinê ne. Hin ji wan ji bo zêdekirin, zayîn û parastina cûreyan in. Herwiha ew bingehê domandina jiyana mirovan e. Her lebatek ku ji tevnên heman cûreyî pêk tê; da ku erkê xwe birêkûpêk pêk bîne. Hin lebat hene em dikarin wan bi çavan bibînin, mîna çerm. Lebatên hundirîn jî yên ku em nikarin wan bi çavan bibînin mîna dil, kezeb û hwd...

### Navên lebatên laş


Parçeyên laş dabeşî du beşan dibe ew jî ev in: Parçeyên laş ên derve û Parçeyên laş ên hundir.

### Lebatên laş ên derve;

Lebatên laş ên derve ew ên ku têne dîtin û pir caran laş vedişêrin. Ew jî wiha ne:
Çerm: Yek ji mezintirîn lebatên laş tê hesibandin. Herwiha ew bi berdewamî nû dibe û di xulikekê de di navbera 30 hezar û 40 hezar şane dimirin û bi şaneyên nû têne guhertin.
Girîngiya wê di van xalan de ye: Beşek ji pergala bêhindayînê ye. Ew hewa derbasî nava laş dike. Hewayê ji bo laşê mirov guncaw dike û ji bo parzûna madeyên qirêj ji hewayê kar dike.
Poz: Yek ji lebatên laş e. Ew hewayê derbasî nav pişikê dike da ku oksejîn bigihîje damaran.
Dev: Beşek ji sîstema helandinê ye ku xwarin bi rêya wê dikeve laş. Ji lêv, ziman û diranan pêk tê.
Çav: Ew parçeyekî giloverî ye di nava şikefta çavê mirov de ye û berpirsiyarê dîtin û têgihîştina tiştên li dora mirov e. Ew yek ji lebatên hest e.
Por: beşeke girîng ê laş e. Ew qapaxa serî vedişêre û diparêze.
Guh: Berpirsiyarê bihîstin û hevsengiyê ye. Deng werdigire û berhev dike û nîşanên demarî dişîne mejî.
Neynûk: Ew parçeyê hişk ku li serê tiliyan e. Herwiha ew alîkariya xurtkirina tiliyan dike.
Lebatên hundirê laşê mirov: Parçeyên hundirîn ew in ku di hundirê laş û di bin çerm de ne, piraniya wan ji hêla çerm, rûn û hestiyan ve têne parastin. Ew wiha ne:
Gurçik: Yek ji girîngtirîn lebatên laş e, ji du cotan pêk tê, her yek li aliyekî zik e. Ew di teşeya fasoliyan de ye û dirêjahiya wê dighêje 13 cm. Ew ava zêde ya di laş de ji holê radike û bi rêya pergala mîzê derdixe.
Dil: Ew yek ji lebatên laş e ku heke çend kêliyan raweste, mirov dimire. Ji ber vê yekê, jê re parçeyên jiyanî tê gotin. Ew xwînê dişîne hemû şaneyên laş, li nîvê sîngê ye û bi qasî kefa destê mirov e.
Kezeb: Li aliyê rastê yê jorîn ê zik de ye. 500 karan pêk tîne. Ew enerjiyê di glycogen de hilîne. Ew jehrê ji holê radike. Ew hin enzîman vedişêre ku di pêvajoya helandinê de dibin alîkar.
Pişik: Yek ji parçeyên girîng ên laş e. Ew li pişt qefesê singê, li pişt singê ye. Bi rêya bêhnkirinê oksîjenê tîne laş û karbondîoksîtê derdixe.
Boriya henaseyê (Elqesebe-Elhewiye): Ew pişikan bi poz û dev ve girêdide. Lariks (Hincere) tê de ye ku deng derdixe. Ew hewayê ji poz û dev berdide pişikan.
Mejî: Ew di hundirê qoqa serî de ye. Ew wekî parçeyê navendî ya laş tê hesibandin.
Ew bi rêya stûna piştê peyaman ji hemû parçeyên laş re dişîne, da ku erkên xwe pêk bînin. Ew hemî fonksiyonên laş, wekî nefesgirtin, helandin, tevger û dîtinê kontrol dike.
Gede: Parçeyekî sîstema helandinê ye. Xwarinê dike perçeyên biçûktir. Hin enzîmên pêwîst ji bo pêvajoya helandinê çêdike.
Roviya zirav: Ew lûleyek e ku dirêjahiya wê dighêje 7 metreyan dirêj. Ew hemanên ji xwarinê dimije.

### Parçeyên hundirîn çi ne?

Parçeyên hundirîn yên sîstema parastinê: Tonsîlên, Hestiyê hestî, Girêkên lîmfê, Sipil, Adenoîd, Tîmus û Zikê pêvek.
Endamên sîstema demarî: Mejîyê piştê, Mejî û Demar.
Sîstema muslkeyên tevgerî ji van parçeyan pêk tê: Îskelet, Masûlke, Tendon û Lîgament.
Parçeyên sîstema mîzê: Gurçik, Mîzdank û Mîzrav.
Parçeyên ku bi pergala lîmfatîkê ve girêdayî ne: Hin bez, Girêkên lîmfê, Damarên lîmfê û Kanalên lîmfatîk ên cûda.
Sîstema gera xwînê: Xwîn, Damar û Dil.
Masûlke: Ew yek ji parçeyê laş tê hesibandin û di hemî beşên wê de tê dîtin. Gelek cureyên wê hene, ku ev in:masûlkeyên avahi, masûlkeya dil û masûlkeyên nerm. Hin beşên laş bi masûlkeyên bêîrade ve girêdayî ne, wek: Rovî, pişik, parçeyên hilberandinê yên nêr û mê, endamên pergala bêhninvedanê, Sîstema mîzê û hwd…



## Sudoku: Bersiv 45

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 8 | 9 | 7 | 2 | 4 | 5 | 1 | 6 |
| 1 | 2 | 5 | 6 | 8 | 9 | 7 | 4 | 3 |
| 4 | 6 | 7 | 1 | 3 | 5 | 2 | 8 | 9 |
| 7 | 5 | 4 | 8 | 9 | 3 | 1 | 6 | 2 |
| 8 | 9 | 1 | 5 | 6 | 2 | 4 | 3 | 7 |
| 6 | 3 | 2 | 4 | 7 | 1 | 8 | 9 | 5 |
| 5 | 7 | 6 | 9 | 1 | 8 | 3 | 2 | 4 |
| 2 | 4 | 8 | 3 | 5 | 6 | 9 | 7 | 1 |
| 9 | 1 | 3 | 2 | 4 | 7 | 6 | 5 | 8 |

## Sudoku:Pirs 46

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 9 | | 2 | 4 | 3 | | | 7 |
| | 3 | | | | | 4 | | 5 |
| | 4 | | | | 6 | | 2 | |
| 3 | | | | | 7 | 2 | | |
| | | 4 | | | | 3 | | |
| | | 9 | 3 | | | | | 1 |
| | 7 | | 6 | | | | 3 | |
| 4 | | 5 | | | | | 8 | |
| 6 | | | 9 | 8 | 2 | | 5 | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER XIRABÎ Û NEQENCIYÊ**

**Bêhna dojehê ji devê wî tê:**
- Pir zordest e; pir xirab e; weke cenawiran e; dirinde ye.
**Bûye weke dêlika li ser toleyan:**
- Mirov newêre xwe nêzîk bike.
**Çavrû nemaye:**
- Mirovatî nemaye; êdî ti kes qenciyê nake.
(Dema ji mirovekî alîkariyek, tiştek tê xwestin, digel ku dikare bike jî lê ji nebaşiya xwe nake, hingê tê gotin)
**Çem bê çeqel nabin:**
- Dema behsa xirabiya mirovekî tê kirin hingê tê gotin.
**Çêlekeke rîxo garanekê dilewitîne:**
- Yek tenê xirabiyê dike lê derdora wî tev ji ber kirina wî zererê dibîne.
**Destê bitenî rûyê mirov reş dike:**
- Nebaşiyên mirov, mirov şermezar dikin.
**Didanên xwe veşêre se li hestiyan digerin:**
- Dema mirovekî xirab, yan bixeter derekê re dibore hingê tê gotin.
**Erd jî hilnagire:**
- Gunehên wî pir in.
**Ez hatime daweta te, tu hatî diziya min:**
- Ez qenciyê li te dikim, tu xirabiyê li min dikî.
**Gelî bê şîlan nabin:**
- Dema behsa xirabiya mirovekî tê kirin hingê tê gotin.
**Golikê vijoker e:**
- Yê xirabiyê ye; ti caran qenciyê nake.
**Gotin baş e baş e, çû di cirnê gund de rît:**
- Kesên bi qencî behsa wan bê kirin û biçin xirabiyê bikin ji bo wan tê gotin.
**Gotin, delalî delalî, çû di serê kaniyê de rît:**
- Bi heman wateyê.
**Guhê xwe da şeytên:**
- Tişteke nebaş kir.
**Hat ser çoka min dest avêt riha min:**
- Ji bo kesê hin qenciyê pê dikin lê ew xirabiyê bi wan dike tê gotin.
**Hem ker e, hem se ye:**
- Kesên di her warî de xirab ji bo wan tê gotin.
**Îmam Elî kuştine pirsa xwîna kêçan dikin:**
- Xirabiyên herî mezin dike pirsa wan nake, pirsa tiştên piçûk dike.
(Dibêjin; yên Îmam Elî kuştîn pirs dikirin, digotin; golo, bi xwîna kêçan ve nimêj dibe yan na?)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Tulay Hatîmogûllari: Pêkanîna aştiyê, bi avakirina civaka demokratîk pêkan e



Hevseroka Giştî ya Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) Tulay Hatîmogûllari bilêv kir ku rûxmê kongreya PKK'ê û hewildanên Rêber Apo yên çareserî û demokrasiyê, ji aliyê dewletê gavên erênî nehatine avêtin û wiha got: "Çareseriya pirsgirêka Kurd û azadiya Rêber Apo demokratîkbûna Tirkiyê ye."**R-3**

## 'Kevoka Aştiyê di nav şer de nikare bifire'

Banga Rêber Apo a "Aştî û civaka Demokratîk" ji bo tevahiya Rojhilata Navîn pêvajoyekî nû û dîrokî ye. Dayikên Gerîlayên Azadiyê diyar kirin ku dewleta Tirk ji bo aştiyê gav neavêtiye û gotin, "Kevoka Aştiyê di nav şer de nikare bifire."**R-4**



Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1285 | 29-Pûşper-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Li hemberî mekanîzma çapemeniya dijber; Ragihandina Azad



Hevserokê Daîreya Ragihandinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ciwan Mele Îbrahîm diyar kir ku tecrûbe û pêvajoyekî nû ya ragihandinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re hat destpêkirin, ev tecrûbe di aliyê pisportiyê de lewaziyên xwe hebû, lê li bermaberî mekanîzma çapemeniya dijber heta astekî xwedî rol e.**R-5**

# YRJ'Ê RÊXISTINBÛYÎNA HEVPAR A JINÊN ROJNAMEVAN E

Bi armanca gihaştina deng û rastiya jina azadîxwaz ji tevahî cîhanê re, di 28'ê Pûşpera 2020'an de Yekîtiya Ragihandina Jin YRJ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat damezrandin. YRJ'ê ji destpêka damezrandina xwe ve û heta niha, li ser hîmê paradîgmaya Neteweya Demokratîk û azadiya jinê kar û xebatên giranbuha da û dide meşandin. Berdevka YRJ'ê Arîn Siwêd diyar kir ku YRJ'ê di demekê ku pêwîstiya jinên rojnamevan bi rêxistinbûyîneke hevpar hebû hat damezrandin û dikarîbû bibe dengê jinên azadîxwaz.**R-2**




## Bi hunera xwe hêviyeke mezin ji xwe re ava dike



"Mala min cîhaneke biçûk e ku di şer û koçberiyê de nayê desteserkirin, ji xwediyê wê re bîranînek zindî ye ku malek wan li cihekî heye û bê gûman wê rojekê vegerin." Ev pîşeyê koçberê bi navê Zuhêr Remezan e ku bi perçeyên bi çûk ji daran malan çêdike.**R-6**

## Dibistana Niwêla; Dibistana fêrkirina hunerên şêwekarî û dengbêjiyê



Endama Hîlala Zêrîn Roz Hesen anî ziman ku Dibistana Niwêla, dibistana fêrkirina hunerên şêwekarî, dengbêjî û muzîkê ye û got, "Em dixwazin nifşê nû çand û mîrasa xwe ya hunerî nas bike."**R-7**



Li Amedê Konferansek watedar
Ahmet Aktaş R-4



Netewperestî Li Yek Qadê Bi Dawî Nabe!
Idrîs Henan R-5



Mimkûnbûna nasnameyên nekuj
Remezan Olçen R-7

# ‘YRJ’ê rêxistinbûyîna hevpar a jinên rojnamevan e’

Bi boneya salvegera 5'mîn a damezrandina Yekîtiya Ragihandina Jin YRJ'ê, Berdevka YRJ'ê Arîn Siwêd diyar kir ku YRJ'ê ne tenê keyanek an jî teşeyek bû, ew ji nêrîneke zelal hat destpêkirin, nêrîna wê jî ragihandin amûra berxwedanê ye û dengê jina azad bingeha avakirina civakeke demokrat û azad e û got, “YRJ'ê rêxistinbûyîna hevpar a jinên rojnamevan e.”

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Li Kurdistan û cihanê jinên rojnameger bi pênûs û kamareyên xwe rastî û hovitiya li dijî jin û civakê pêk tê, derdixîne holê. Yên vê rastiyê ji cihanê re radigihînin, di heman demê qehremanî û pêşengiya jinên têkoşer jî heta vê kêliyê vedibêjin. Îro roj rojnamegerên azad bi têkoşîn û berdeldayînê li dijî her cûre binpêkirinan, rastiyê radixîne ber çavan. Li dijî pergala netew-dewletê, bi hişmendiya jina azad rêxistinkirina jin û civakê wê dawî li vê destilatê bîne û serkeftina xwe misoger bike. Ragihandina jin li dijî hişmendiya mêr û desthilatdaran ku îro nirxên civakê binpê dike, dikare bibe kelehek. Ev rastî di Kurdistanê de bi awayek şênber tê dîtin. Yekîtiya Ragihandina Jin bûye cihê rûnîkirina rastî û bilindkirina têkoşînê. Ragihadina jina azad, di nava têkoşînek dijwar de li ber xwe dide. Li hember hovitiya pergala zayendperest dibe mewziyek xurt a heqîqetê.

Bi çirûska şoreşa Rojava re, jinan di nava refên têkoşînê de cih girtin. Yek ji van refan jî qada çapameniya azad bû. Jinan xwe di vê qadê de bi rêxistin kirin û xwestin bibin reng û dengê xwe. Bê ku gav paşde bi avêjin, bi pênûs û kamara xwe, pêşengtî ji şoreşa azadiyê re kirin. Çapemeniya Jin a Azad heta niha di oxira heqîqetê de gelek berdêlên giranbûha daye. Li hemberî şerê qirkirin, dagirkirin û talanê gelek jinên rojnamevan bi biryar têkoşîn kirin û di oxira ku rastî di tariyê de nemîne canê xwe fedakirin bûn sembola ked, fedekarî û fedayîtiya çapemeniya azad. Li ser bingehê weke rojnamegerên jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 28’ê Pûşbera 2020’an de xwe bi navê Yekîtiya Ragihandina Jin YRJ’ê ragihand.




**Heqîqet bi xwe di dengê jina azad de ye**

Armanca ragihandina jina azad ew bû ku jina zana û bi cesaret a ku dengê xwe li hemberî berovajîkirina heqîqetê bilind dike, ji bo wê jina ku çek an jî kamîra rakir, ew bi xwe jina zane ye. Herwiha heqîqet bi xwe di dengê jina azad de ye. Ragihandina jin dîrok careke din zindî kir û rastiyên ku bi sedê salan veşartî mabû, derxist holê. Ragihandin ne tenê nave, lê di rastiya xwe de cewhera jiyan û mirovahiyê radighîne. Niha cavên giştî cîhanê li medyayên civakî ne, lewra dema jina azad wêneyên rastiyê parve dikin û heqîqetê şîrove dike, zanebûna jinê diyar dike. Di heman demê de wekî ku ragihandin di hemû qadan de xwedî role, jin jî pêşengê wê rolê ye. Ragihandin bê sînore û bi hebûna jina azad di qada çapemeniyê de, sînorê pergalê têk dibe.

Derbarê salvegera 5’mîn a damezrandina Yekîtiya Ragihandina Jin YRJ, Berdevka Yekîtiya Ragihandina Jin Arîn Siwêd ji Rojnameya me re axivî. Arîn Siwêd di destpêka axaftina de tekez kir ku YRJ rêgeheke berxwedanê ava kir û wiha got: “Bi boneya salevgera 5’an a damezrandina Yekîtiya Ragihandina Jin (YRJ) de, em tekez dikin ku ev salên derbasbûyî wekî rêgeheke berxwedanê çê kir ku me dikarîbûn dengê jinên azad û êşên wan ên rasteqîne, li beramberî zihniyeta zilamsalarî û saziyên kilasîk ên ragihandinê ku jin ji xwe re weke amûr bikar tanîn, derxînin holê.”

**‘YRJ’ê pêwîstiya jinên rojnamevan bû’**

Arîn Siwêd di dewama axaftina xwe de girîgiya avakirina YRJ’ê anî ziman ku pêwîstiya jinên rojnamevan bi rêxstinbûyîneke hevpar hebû û wiha domand: “Di 28’ê Pûşbera 2020’an de Yekîtiya Ragihandina Jin hat avakirin. YRJ’ê di demekê ku pêwîstiya jinên rojnamevan bi rêxistinbûyîneke hevpar hebû, herwiha demekê ku şer li ser jinê bi taybet dihat meşandin û qada ragihandinê jî qada sereke ya vî serî bû, hat avakirin.”

**Xwegihandina jinên rojnamevan li Sûriyê di nava 5 salan de**

Arîn Siwêd eşekere kir ku YRJ’ê di nava 5 salên derbasbûyî de, dikarîbû xwe bighîne jinên rojnamevan yên ji tevahiya bajar û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Sûriyê de û wiha got: “Di van 5 salên derbasbûyî de me dikarîbû xwe bighînin jinên rojnamevan yên ji tevahiya bajar û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Sûriyê, me li wan guhdarî kir û tecrûbeyên wan li ber çavan re derbas kirin. Herwiha em li tevahî cîhanê vebûn û têkiliyên xwe bi rojnamevan û çalakvanên jin ên gelek dewletên cîhanê re, çê kir. Armanca me ji vê yekê jî ku em tecrûbe yan jî hevkariya xwe bi wan re parve bikin. Di vê çarçoveyê de me gelek komxebat û komcivîn bi awayekî dewrî li dar xistin. Qada sereke ya van komxebatan û nîqaşên wê yên sereke jî, rewşa jina rojnamevan û çawaniya ku em karibin lidijberî zihniyeta zilamsalariyê bisekinin, ev zihniyeta ku di saziyên ragihandinê de bûne esas, di vê yekê de me dikarîbû jinan bighînin wê astê ku karibin tecrûbeyên xwe yan jî xwe bi awayekî azad bînin ziman û hevkariyekê di avakirina xîtabeke ragihandinê giştî de, bikin.”

**‘YRJ’ê ne tenê keyanek an jî teşeyek bû’**

Arîn Siwêd da zanîn ku Yekîtiya Ragihandina Jin ne tenê keyanek an jî teşeyek bû, lê ew ji nerîneke zelal hat destpêkirin û wiha pê de çû: “YRJ’ê ne tenê keyanek an jî teşeyek bû, lê ew ji nerîneke zelal hat destpêkirin, nerîna wê jî ragihandin amûra berxwedanê ye û dengê jina azad bingeha avakirina civakeke demokrat û azad e. Îro di salvegera 5’an a damezrandina YRJ’ê de em vê nerîna xwe dîsa dubare dikin, karê xwe bi baweriyeke mezin û tecrûbeyeke xurtir dewam dikin. Baweriya me ew ku tişta me ji 5 salan dest pê kiribû hîna jî hewcedariyeke pê heye ku ji her demekê niha zêdetir hewcedarî bi kar û xebatên me heye, heta ku em karibin Sûriyeke demokratîk û azad ku mafê jinê tê de parastî be, ava bikin.”



**‘Bi vekirina deriyê nîqaşê pêşxistinê di xebatên rêxistinî de bidin avakirin’**

Arîn Siwêd axaftina xwe wiha qedand: “Em tekez dikin ku lidarixistina Konferansê di her qonaxeke girîng de, xwedî girîngiyeke pir mezin e ku em karibin kar û xebatên xwe binirxînin û deriyê nîqaşê li pêşiya hemû endamên xwe vekin, da ku em karibin pêşxistinê di kar û xebatê xwe yê rêxistinî de, bidin avakirin. Ji bo wê niha em hewl didin demeke guncaw ji konferansê re diyar bikin ku em karibin di vê konferansê de, beşdarbûneke zêde ya rojnamevanan û çalakvanan ku karibin guftogoyeke rasteqîn û vekirî ji bo pêşeroja yekîtiyê û rola wê a li ser asta herêmî û navnetewî de bikin, dikin. Di heman demê de em wek yekîtiyê niha desteyên têkildar çê dikin ji bo em karibin sîstema xwe ya hundirîn ji nûv re giftgo bikin û wekî nirxandinekî li ser kar û xebatê xwe yên salên derbasbûyî de bikin. Ev yek jî, ji me tê xwestin ku em karê xwe berfireh bikin li gorî pêvajoya ku niha qada ragihandinê bi giştî û qada siyasî tê de tê meşandin. Herwiha Yekîtiya me roj bi roj berfireh dibe gelek rojnamevan û çalakvan ji hundirê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û derveyî wê jî dixwazin tevlî bibin.”

# Rêber Apo dengê jin û civakê ye

**Arîn Koçer**

Di vê pêvajoya pergala fînans ketiye nav kaosê de û hewl dide civakê di nav lepên xwe de bifebisîne û hêdî hêdî birizîne. Weke tê zanîn pergala desthilatdar her dixwaze hebûn û bingehê civakê ji holê rake. Pergal bi hişmendiya xwe ya paşverû ya dewleta netewe bi her şêweyî êrîşî civakê dike. Bi taybet jî mîna hemû pergalên desthilatperest bi hedefgirtina jinê bingehê avabûna civakê bi awayekî hîn kûrtir digire dest. Bi bîrdoziya xwe ya lîberal û di bin navê azadiya şexsî û ferdî ji civakê qut dike. Jinan pir bi zanebûn dikin meta û bi her şêweyî jinê dikin mijara bazarê. Pergala serdest ji bo avakirina desthilatdarî û serweriya xwe gotiye ku destpêkê li jinê bidin. Rêber Apo bi fikir û felsefeya xwe rêya çareserî û rizgariya jin û civakê vekir. Hewce ye were zanîn ku levîathanê pergala fînansê dixwaze serweriya xwe li ser hemû şaneyên civakê çêbike û wê daqurtîne. Rêber Apo jî li beramberî vê pergala hov gotiye ku destpêkê divê jin xwe rizxgar bike. Felsefa azadiya jinê ya Rêber Apo weke rêbaz daniye holê, ji bo hêza jinê ya vîn û baweriyê jiyanî bibe û herikbar bibe çavkaniyeke herî esasî ye. Rêber Apo tenê ne Rêberê gelekî, yê hemû mirovahiyê ye. Ji tevahiya mirovatiya pêşverî re bûye dengê jin û civakê.

Teqez gerek were zanîn ku di divê pêvajoyê de, tevahî pergalên cîhanê yên desthilatdar ketine nava şer û pevçûnên pir mezin. Dubare Rêber Apo dibêje ku serdema şer derbas bûye û divê were bidawîkirin. Banga Rêber Apo ya 27’ê Sibatê ji tevahî gelan re bû derman. Ji bo her kes têkeve nava lêkolînê û rastiya pergala desthilatdar û tundrew bizanin ev pêvajo pir girîng e. Dîsa ji bo li hemberî wê pergala kevnar û zalim helwesta xwe deynin holê û têkoşîn bikin, derfet çêbûne. Banga Rêber Apo pêvajoya jinan û civakê bi temamî guhert û çavê wan li rastiyê vekir da ku xwe bikin eniya dijberî pergala serwer.

Peyama Rêber Apo ya ji bo çareserî û aştiyê, rastî raxiste ber çavan. Rêbertî ji bo pêkanîna pergala wekhev û demokrat bi her awayî kete nava liv û tevgerê. Tê zanîn ku şert û merc jê re ne asteng e û ji bo pêk anînê armancê di şertên herî zehmet de jî têkoşînê xurt dike û arastekirina wê pêk tînê. Tevgerê jî dilsoziya xwe her tim daye diyarkirin. Bingehê têkoşînê li ser çi esasî ye û bi awayekî berbiçav ji banga Rêber Apo re bersivê herî rast da û kongreya xwe ya 12’emîn a partiyê pêk anî. Di wir de biryara fesixkirina PKK û sekinandina têkoşîna çekdarî da. Niha di asta cîhanî de ev mijar rojeva sereke ye û ji hêla pir hêz û aliyan ve tê nîqaşkirin.

Weke tê zanîn PKK’ê 52 salan roleke pir mezin girte ser xwe, bi fedakariyeke mezin têkoşîn da û bi hezaran cangorî û serkeftinên xwe heye. Pêkanîna biryarek wisa ji bo demê pêwîst û çêker e. Dibe ku hêzên muxalif û provokator vê pêvajoyê bi awayekî berevajî binirxînin, her cure xerabiyan bikin. Ji bo valaderxistina pêvajoyê bi her şêweyî bikevin nav liv û tevgerê. Hewce ye em zanibin fesixkirina PKK’ê nayê wateyê têkoşîn hatiye sekinandin. Berevajî têkoşîn derbasî qonaxekê din bûye. Divê were zanîn ku berpirsyarî û erkên demê dikevin ser milên her mirovekî Kurd. Ev guherîna paradîgmayî ji bo avakirina civakek demokratîk û sosyalîst gelekî girîng e. Ev têkoşîneke hîn xurtir û bi displîntir dixwaze. Her çiqasî dewleta Tirk hê bersivek ku garantiyê bike nedabe jî û êrîşên xwe bi dawî nekiribe jî divê ya bingehîn ew be ku em bi her şêweyî pêşî li her cure provakasyonan bigirin, xwe ji bo gihandina armancê kilît bikin. Em weke jin û ferdek ji civaka Kurd divê em xwe û civaka xwe amade bikin û biçin serkeftinê.



# Dibistana Niwêla; Dibistana fêrkirina hunerên şêwekarî û dengbêjiyê

Endama Hîlala Zêrîn Roz Hesen anî ziman ku Dibistana Niwêla, dibistana fêrkirina hunerên şêwekarî, dengbêjî û muzîkê ye û got, “Em dixwazin nifşê nû çand û mîrasa xwe ya hunerî nas bike.”

**Hêvî Keleş/Qamişlo**


Dibistana Nuwêla ji aliyê hunermendên herêmê di sala 2020’an de li Qamişloyê hate vekirin. Dibistan bi navê şehîd Nuwêla (Rîhan Hesen) hate navkirin, ji ber Şehîd Nuwêla bi hezkirina xwe ya ji huner û stranbêjiyê re dihate naskirin û her wiha li gelek amûrên muzîkê dida.

Derbarê Kar û xebatên ku Dibistana Nuwêla dide meşandin Endama Hîlala Zêrîn Roz Hesen ji Rojnameya me re axivî.

**‘Dibistana Nuwêla di bin sîwana Hîlala Zêrîn de hate avakirin’**

Endama Hîlala Zêrîn Roz Hesen diyar kir ku Dibistana Nuwêla di bin sîwana Hîlala Zêrîn de ava bûye û wiha got: “Ev pênc sal in ku Dibistana Nuwêla hatiye vekirin, navê Nuwêla jî ji navê jina şoreşger ya ku bi hunerê mijûl dibû, ji bo mayîndekirina hest û hunera wê me navê dibistanê kir Şehîd Nuwêla. Di dibistana Nuwêla de beşên cuda hene, mîna Muzîk, Şano û wênesazî û her yek ji wan jî li ser du astan e, li gorî hejmara şagirtan, Mamoste û hunermendên pispor çavdêriya wan beşan dikin. Di beşê Muzîkê de keman, erbane, gîtar û tembûr hene û ew jî li ser du astan e. Xwendekar destpêkê nota û stranbêjiyê bi awayekî teorîk fêr dibin, piştre derbasî pratîkê dibin û fêrî lêdana amûrên muzîkê dibin. Her wiha di her beşekî de ji bo fêrkirina şagirtan memosteya wê heye, minhac heye li gorî wî minhacî em wan şagirtan fêrdikin. Tenê zarok û jinên ciwan ên temenên wan di navbera 8 heta 40 saliyê de em pêşwazî dikin û em wan di aliyê teorîk û pratîk de perwerde dikin.”





**‘Huner, rêbazeke veguhastina mîrasa çandî ye’**

Roz Hesen axaftina xwe wiha qedand: “Hin astengî di karê me de derbas dibin ew jî fêrkirina yên bi temen mezin e, ji ber dema ku temenê wan biçûk be bêhtir zû fêr dibin û zehmetiyan di fêrkirina wan de nabînin. Hejmara şagirtên me jî nediyar e ji ber dema ku dibistan vedibin şagirtên me kêm dibin û di havînê de dîsa tên fêrî dersên xwe dibin li vir, ji ber zêdebûna şagirtan em li ser du danan didin yê sibeha û yê piştî nîvro. Her sal Mehrîcana zarokan heye di meha 9’an de ye şagirtên me yên muzîkê, şano û wênesaziyê beşdarî mihrîcanê dibin, bi wêneyên xwe, lêdna amûran û şano beşdar dibin. Mebesta me ji avakirina Dibistana Nuwêl ji bo fêrkirina zarokan li ser mîras, huner û çanda kurdan, bi taybet huner ji ber ku huner, rêbazeke veguhastina mîrasa çandî ye.”

# Huner zindîkirina hiş û dîrokê ye

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Wênesaz Şoreş Eyo diyar kir ku huner zindîkirina hiş û dîrokê ye, ya ku serdemê baş tîne ser ziman huner e û wiha got: “Dîrok bi rêya hunerê digihêje nifşên nû, hebûna wênesazekî dibe ku zêde ne bi wate be, lê belê hebûna gelek wênesazekî dikare hunereke xurt biafirîne.**

Huner ji aliyê civakan ve ji bo afirandina bîr û misogerkirina civakê di tevahiya dîrokê de hatiye bikaranîn. Ruxmî gelek astengiyan jî, ciwan di hemû qadên hunerê de rola herî serke lîstine. Yek ji wan ciwanên ku bi hezkirin xwe pêşxistiye Şoreş Eyo ye ku li hemberî zextên civakî li ber xwe daye û xwe di şaxên hunera wênesaziyê de ava kiriye. Dihizire ku huner ne tenê naveke; xwedî hêzek e û dikare civakê biguherîne û zextên ku li ser gel tên kirin bişkîne.

Şoreş ji bajarê Qamişlo ye, ew bi temenê 23`ê sal î ye û pir ji hunera wênesaziyê hez dike, Şoreş Eyo wiha ji Rojnameya me re hestên xwe ji civakê re ragihand.

**Tu astengî li pêşiya xwe nedîtin**

Şoreş anî zimna ku ew ji zaroktiya xwe ve ji hunera wênesaziyê hez dike û mîne xewnekê bû jê re ku pêş bikeve û bibe mamosteyê hunera xwe. Lê belê ji ber ku temenê şoreş ne pir mezin bû tenê di mal de xwe pêş dixist. Bê guman ev pêşketin bêyî tu alavên wênexêziyê bûn, tenê bi pênûsa şîn ango bi kûmirê wêne xêz dikirin û wiha got: “Ruxmî van zehmetiyên ku min di zaroktiya xwe de dikşand lê tiştek li hember vê pêşketinê nebû kelem û min xwe roj bi roj pêş xist.”



**Ji sala 2021‘an dest bi karê wênexêziyê kir**

Şoreş di nav axaftinên xwe de got ku ev 4 salin wênexêziya xwe bi civakê re parve kiriye û tevlî du pêşengihan dibe. Ew bi tevlîbûna pêşengihan pir kêfxweş dibe ji ber ku ji bo Şoreşê derfetek tê avakirin ku xwe hîn bêhtir pêş bixe û nêrînên gel li ser tabloyên xwe bistîne. Him jî di van pêşengihan de wênesazên mezin nas dike û tiştên pir xweşik ji wan digire da ku tabloyên wan ji bo xwe bike mînek, di hema demê de Şoreş dixwaze ku tevlî gelek pêşengihên derveyî Rojavayê Kurdistanê bibe û çanda her kesî nas bike.

**‘Bi şoreşa Rojava re me karîbû xwe îfada bikin’**

Şoreş di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku yek ji sedemên herî mezin ji pêşketina wî re piştgirya ku heval û malbata wî danê û wiha pêde çû: “Em di rastiyekê de ne ku civaka me piştî ket bin kontrola Rêveberya Xweser de, me ji nû ve pêşketina xwe nas kir, me di her cihî de karîbû xwe îfade bikin û tirsa dilê xwe bişkîne. Her wiha ez pir sipasiya civaka xwe dikim. Sipasiya malbata û hevalên xwe jî dikim ji ber ku wan gelekî piştgirî dan min.”

Şoreş diyar kir ku huner zindîkirina hiş û dîrokê ye. Ya ku serdemê baş tîne ser ziman huner e. Dîrok bi rêya hunerê digihêje nifşên nû. Hebûna wênexêziyê dibe ku zêde ne bi wate be, lê belê hebûna gelek wênexêzan dikare hunereke xurt biafirîne. Mirov bi parvrekirinê dijî. Vegotin û hînkirin nîşaneya têgihiştinê ye, mirovan mezin dike. Gihandina hunerê ji civakê re nîşaneya serkeftinê ye. Ez ji ber vê girîngiyê didim hunerê. Parvekirin ji bo min cihê kêfxweşiyê ye.

Şoreş di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Pêşketina civakê ji erkê me ye û her ciwan pêwîste vê erkê hilgire ser milê xwe. Em di her kêliyê de dixwazin welatê xwe pêş bixin û ji bona ku bibin rastiya civaka xwe. Hêviya me her dem ew e ku em ciwanên Kurd bi taybet bibin yek dest û li hember her şerekî taybet serî hildin. Pêwîste em bi pênûs û zanebûna xwe bighêjin armanca xwe.”



## Mimkûnbûna nasnameyên nekuj

**Remezan Olçen**

Di rojnameya Yenî Yaşamê de rêzenivîsên civaknas Nazan Ustundag hat weşandin. Di wan nivîsan de di ser Banga Aştî û Civaka Demokratîk û Perspektîfa Rêber Apo bi rastî jî nivisine hêja amade kiribûn. Tê de behsa ramyara reşik Dennise Ferreira da Silva jî kiribû ku ew li ser rejîmeke nû ya zanînê pêşniyazên xwe hene. Meqaleya Da Silva ya bi sernavê ‘Cudatiya Bêveqetîn’ me vedixwîne em rejîmeke nû ya zanînê esas bigirin. Ev dawetname wê asoyên nû li ber fikrînê jî veke. Çima? Te de; Gandhî gotinek, şîretek xwe heye dibêje; “Baş bifikirin ji ber ku fikra we dibe axaftina we, baş biaxivin ji ber ku axaftina we dibe tevgera we, baş tevbigerin ji ber ku ew tevger dibe karaktera we, bila karaktera we qewîn be ji ber ku ew jî dibe çarenûsa we.” Hingê giringiya fikr û ramanê li vê derê kifş dibe.

Da Silva dibêje ku modernîteya kapîtalîst bi rêya ‘veqetînê’ ferq û mêlî dixe navbera mirov û xwezayê, dixe navbera biqewet û hêjarê, dixe navbera civak û neteweyan, nasname û olan, jin û mêran. Lê ew dibêje; ev ferq û mêlî dikarin bi hev re din ava têkiliyeke sîmbiyotîk de bin û bi ferqên xwe bi hev re jiyaneke lihevhatî jî ava bikin. Yanî aliyên ji hev cuda ango aliyên ku bi taybetmendî û xweseriya xwe ji hev cuda ne dikarin bêyî ji hev veqetin jî bi hev re bin, bi hev re bidin bistînin.

Dêhna xwe bidinê di sedsala 21’ê de hîn jî tevî ewqas krîz û qeyranan têgîna nasnameyê ji çareseriyê wêdetir dibe sedem û çavkaniya şer û pevçûnan. Nasname aîdiyetê destnîşan dike. Aîdiyeta cinsî, bawerî, netewî heta bi siyasî hwd… Nijad, netewe, bîr û bawerî û cinsiyet ev ferqên çêkirî ne weke dewlemendiyê lê weke xetere hat dîtin û hat wêderkirin. Ev bi xwe ser hîn jî serdestî û bindestiyê hildiberîne. Ev nasnameyeke kujer e û tehemûla xwe ji nasnameyeke din re tine. Di vir de mirov ji xwe dipirse; gelo zemîneke felsefî û siyasî ya alternatîf tine li dijî vê nasnameya kujer?

Li vê derê pêşniyaza Da Silva ev e ‘Cudatiya bêveqetîn’. Ev pêşniyazeke ontolojîk e. Cudabûn tên qebûlkirin û ev cudabûn nabe sedema ji hev veqetînê. Di vir de mirov heke vê pêşniyazê rabe û ji bo çareseriya pirsa Kurd jê sûdê bigre wê feydeya xwe jî hene. Ji ber ku ev rêya fikrîneke nû rejîmeke nû ya zanînê li ber mirov datîne. Yanî ew nasnameyên kujer dikarin veguherîn û bibin nasnameyên demokratîk. Ma pêşniyaza Rêber Apo jî ne li ser vî esasî ye? Rejîma zanînê ya berê ferqan tine dike herkesî dixe nava qalibekî. Yan herkes Tirk e yan Ereb e yan Pars e. Li gorî wê îdraqa berê ya modernîteya serdest Kurd tine ne. Yan jî hebûneke ku divê bê tinekirin.

Rêber Apo bi pêşniyaza xwe ya Neteweya Demokratîk onotlojiyê dikşîne ser zemîna siyasî. Ev çi ye? Bi kîjan rengî çêdibe? Li şûna netewe bibe dewlet li şûna dîn û diyanetek bibe serdest li şûna mêr serdest û jin bindest be ew pêşniyaz dike ku hemû gel û civak, dîn û diyanet, jin û mêr bi ferqên xwe hebin. Pergaleke li ser piralîbûnê pêşniyaz dike ne li ser pirbûnê. Li ser vî esasî çand û huner belkî ji hemû qadan zêdetir ji bo çêkirina rejîma nû ya zanînê bi kêr bê. Ji ber ku poetîka di temamê demên dîrokê de bandorê li polîtîkayê kiriye û dike. Her çend îro ew jî weke entustriyekê nava wê tê xwestin bê valakirin jî hîn jî hêza xwe heye ku dikare biguherîne û veguherîne.

# Bi hunera xwe hêviyeke mezin ji xwe re ava dike

"Mala min cîhaneke biçûk e ku di şer û koçberiyê de nayê desteserkirin, ji xwediyê wê re bîranînek zindî ye ku malek wan li cihekî heye û bê gûman wê rojekê vegerin." Ev pîşeyê koçberê bi navê Zuhêr Remezan e ku bi perçeyên bi çûk ji daran malan çêdike.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Di odeyeke piçûk li Dibistana Hisên Ebdullah li taxa Kornîşê ya bajarê Qamişlo, jiyan ji nû ve li ser destên welatiyekî ku ji neçarî koçber bûye bi karê xwe yê desta, çirûskek hêviyê ava dike. Zuhêr Remezan koçberê ji Efrînê ji ber şer neçar bû biçe li Til Hasilê bi cih bibe piştre berê xwe dide Efrînê. Dewleta tirk û komên çekdar yê girêdayî wê, di Adara 2018 êrişê bajarê Efrînê kirin û piştî 58 rojan ji şer Efrîn hat dagirkirin. Zuhêr careke din berê xwe dide Şehbayê. Piştî ketina rêjîma Esed koçberî dîsa dibe behra Zuhêr Remedan û malbata wî û ew berê xwe didin bajarê Qamişlo û di gel 16 malbatên din di dibistana Hisên Ebdullah bi cih dibe.

Zuhêr bi rengekî cuda koçberiya xwe dibuherîne. Ew bi çêkirina malan ya bi darikan rojê xwe diqedîne û di çêkirina wan malan de hêviya vegera mala xwe ya ku li pişt xwe hiştiye, dike.

**`Hunereke ku dil bi hêviyê tijî dike`**

Zuhêr sala 2014`an ji bo buhirtina demê dest bi çêkirina malan kir lê sal bi sal jê re bû mîna karekî sereke û çêkirina malan mîna bîranînên malên ku di şer de hatine wêranikirin, çêkirina wan destpêkir. Tevî ku amûrên bi kar tîne jî tenê kêr û silîkona ku bê daran bi heve girê dide ye.

Remezan der barê hunera xwe de wiha dibêje: "Ji ber hezkirina min ya zêde ji vî karî re ez dixebitim, ne ji bo firotinê. Herwiha piraniya caran ji bo hevalên xwe yên ji van malan hez dikin dixebitim. Min gelek mal çêkirin û ji bo bîranînê min diyarî hevalên xwe kiriye. Tenê ez peydekirina daran ji wan dixwazim."



Zuhêr wiha got: "Şer malên me wêran kirin, lê min nikarîbû bê xanî jiyan bikim lewra min bi destên xwe dest bi avakirina wê kir, her çendî ji dar be jî, lê hêviya demên pêşerojê di dilê min de ava dike."

**Bi derfetên hindik, wateyên mezin avadike**

Remezan bawer dike ku her perçeyek ku ew diafirîne çîrokek û peyamek wî heye û wiha dibêje: "Mirov wan tenê mîna peykeran dibînin, lê ez wan wekî jiyanek din, cîhanek piçûk û paqij ku ji şer an ji cîhûwarkirinê dibînim."

Di derbarê amûrên xwe yên hêsan de dibêje: "Ez amûrên pêşketî bikar naynim, hem ji ber derfetên min nine hem jî hezkirina min ji vê pîşeyê, çavên min bûne pîvana min. Eger derfetên min yê madî bi min re biba alîkar, minê ji wisa bêtir hunera xwe ya desta pêş bixista. Ji bo min qetên darîn ne tenê perçeyek e, ew kevirê xênî ye ku dikare hêviyek nû di hundirê min de biafirîn ne. Bê gûman karê min yê ku pê malbata xwe xwedî dikim jî bi min re dibe alîkar ku di karê xwe yê desta de pêş bixim, çimkî karê min avakirina xaniya ye."

Remezan ji ber ku qîmeta malên ku çêdike ji madî zêdetir manewî dibîne ti malên xwe nefirotiye kesî û wiha gotina xwe bidawî dike: "Kî ji min re daran bîne, ez ê ji wan re xaniyek çêbikim. Armanca min jê ew e ku karê ez jê hez dikim bixin dilê mirovê derdora xwe û di diyariya xwe de, di bîra wan de bimînim."

# Koçer û taybetmendiyên wan

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Li Kurdistanê koçerî xwedî dîrokeke kevnar e û tê wateya şêweyê jiyana komînal a ku ji stresê jiyana bajarvaniyê dûr e. Karê koçertiyê sewalvanî bû û koçer bi xwezayê re xwe dikirin perçeyek. Ew her demsalekê li warekî bûn, mala wan her li ser milê wan bû û rêya wan dûr û dijwar bû.**

Li Kurdistanê koçerî xwedî dîrokeke kevnar e. Li dijî moderníteya kapîtalîzme koçer, çanda dîrokî ya komînal diparastin. Koçer hemû karî bi hev re dikirin û jiyana parvekirinê esas digrtin. Bi moderníteya kapîtalîst ve takekesî pêşket, lê koçerî berovajî vê yekê li dûrî modernîte jiyaneke bi hev re û parvekirinê esas digrtin. Koçeran zivistanî konên xwe li deştan vêdigirtin û heta demsala biharê li deştan zivistanê derbas dikirin. Bi demsala biharê re barê wan li ser mile wan bû û dadiketin çiya û zozanan. Heta demsala payîzê jî li zozanan diman. Debar û karê wan yê sereke jî xwedîkirina sewalan e. Sîstema jiyana koçertiyê berdewam dike heye 1928'an, êdî nema diçin zozanan ji ber ku sîstema dewlet ava dibe û sînor çêdibin. Êdî ev mirovên koçer di vê herêmê de dimînin, çend sal derbas jî dibin hîn li hêviya çûna zozana ne, hîn tê negihiştine ku sîstema dewlet ava bûye, sînor hatine danîn û peyman hatine îmzekirin. Li vê herêmê çêre kême, avhewaya wê ne wek ya li zozana ye, êdî bi demê re ew abûriya di destê wan de kêm dibe û ew hijmara mezin ji sewalan namîne û feqîrî belav dibe. Êdî civakên çandiniyê hêdê hêdî xwe didin pêş tevî ku pêşketin di wê demê de ji bo çandiniyê nebû, tenê alava çandiniyê cot bû di encamê de her du civak feqîr dibin. Heya sala 1940'î û pê de êdî hêviya vegerê li cem koçeran dimire, êdî konê xwe dikin kol paşê ji kola dikin avahî û heya salên 1950'î yê êdî gundan ji bo xwe ava dikin.

**Koçer du beşin; Çoxsorin û Şilid in**

Yên çoxsor; eşîra Mêra, Sorî, Duyî, Garisa û Elikî ne. Şilid jî; eşîra Mûsa Reşa, Batuyî, Teya, Xêrika û Kiçî ne. Di nav Şilidan de Batuyî serwerê dikin. Ev eşîr li vir bi cih bûne û dev ji jiyana koçeriyê jî berdane. Koçerên Şilid di salên 1940'î de berê xwe dan van dera û bi cih bûn dema mirov bala xwe dide zaravê wan xuya nakin koçer in, ji ber ku ji demek dirêj ve bûne gundî zaravê wan hatiye guhertin, mirov dikare bêje ku ew taybetmendiyên jiyana koçertiyê di nav wan de winda bûye. Di heman demê de di milê pîşe de yên Şilid di bajar de navdarin bi zengînbûna xwe. Civaka koçer mirovan di nav xwe de qebûl dikin, dema mirov diçe gundên Mîra têde mirovên ji bawerî û eşîrên cûda hene. Li Rojavayê Kurdistanê piraniya xwe koçerê Mîra ne, li gundê Girkê Hêwil Teya hene û li Elî Gamêş, Şirik û Teqilbeqil Xêrikî hene, her wiha malên Kiçî li ser destan tên hijmartin û Batuyî jî heman tişt her çend male li gundekî ne. Berdewamiya van hemûyan him li Bakur û him li Başûr bi cih bûne.

**Taybetmendiyên eşîrên** koçeran

Sîstema eşîrtiyê sîstema herî pêşketiye ji serdemên berê heya niha. Koçer bi merdbûna xwe tên naskirin, ji ber ku abûriyeke xurt di destê wan debû û serê malê 3 hezar serî pez wan hebû, dema mêvan dihatin yan jî bobelatek hatiban serê hin Kesan çend sewal didan wan heya niha jî bandora vê çandê li ser koçeran heye û bi merdbûnê tê dîtin. Herwiha bi mêraxasiya xweparastinê tên naskirin, civakeke ku bi vê hijmarê û di qonaxên dirêj re derbas bûne helbet pêwîstiya wan bi xweparastinê heye, lewma ji bo xwe sîstema xweparastinê avakirine yek bi riya yekîtiyê, camêr bûn, çekên baş û mehînên herî baş. Di nav koçera de efû kirin û li hev bûrandin heye li hemberî hev kuştinê û şer nakin ji ber ku heger yek mirovê wê civakê di dema berê de ji wir



bar kiriba wê hatiban talan kirin, lemwa hertim li derdora hevin û çi kêmasî û qisûr çêbûban jî pêwîste li hev ebû bikin, di perwerdeyên xwe yên jiyanî de jî zarokên xwe fêrî vê yekê kirine heya roja îro jî li derdora hevin û li gundan li cemhev mane. Di nav koçeran de jin gelek pîroz e û bi nirx tê dîtin ji ber ku çawa mêr malxuye jin kebaniye jî, her yek ji wan beşekî civakê bi rêve dibin û di hemû beşên jiyanê de jin li kêleka mêre.

Her wiha taybetmendiya civaka koçer pêwîste xwezayê nasbike, ji ber ku şêwazê jiyana wan li ser wan tiştaye, lewma di stêrnasiyê de jî xurtin û mehên salê û rewşa wan kirine helbest û ji nifşên li pey xwe re jî gotine. Di heman demê de koçer di aliyê hunerî û wêjeyî de gelek dewlemendin, ji ber ku civakên koçer di asoyên dîtina xwe de vekirîne li gor wê wêjeya xwe avadikin û erdîngariya ku lêdigerê jî rengîne û li cem wan hestên xurt avadibe. Civaka koçer bi zanebûna pîşe tê naskirin ji ber ku ew her di nav lêgerînê de ne û cihê xwe diguherînin dema pêwîstiya wan bi tiştekî hebe neçarin ew bixwe xwe fêr bikin. Di heman demê de koçer pêwîste di milê bijîşkbûnê de jî pispor be ji ber ku civaka ku di çiya de diçe û rastî avhewayên cûda tê helbet wê nexweşî jî derkevin pêşiya wan, ji ber ku ber bi cihên dûr ve diçin neçar dibin bijîşk û çêkirina derman jî ji cem wan be. Ev taybetmendî ji dema berê ve li cem koçeran heye û heya roja îro jî hîn hene.



# Tulay Hatîmogûllari: Pêkanîna aştiyê, bi avakirina civaka demokratîk pêkan e

Hevseroka Giştî ya Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) Tulay Hatîmogûllari bilêv kir ku rûxmê kongreya PKK'ê û hewildanên Rêber Apo yên çareserî û demokrasiyê, ji aliyê dewletê gavên erênî nehatine avêtin û wiha got: "Çareseriya pirsgirêka Kurd û azadiya Rêber Apo demokratîkbûna Tirkiyê ye."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Di derbarê pêvajoya piştî Banga Rêberê Gelan Rêber Abdullah Ocalan ya "Aştî û Civaka Demokratîk" û piştî hewildanên Tevgera Azadiyê û nêzikbûnên hikûmeta Tirk derheqê pêvajoyê de, Hevseroka Giştî ya Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) Tulay Hatîmogûllari pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

**- Pêvajoya ku ji aliyê Rêberê Gelan Rêber Apo ve hatiye destpêkirin û heya niha dimeşe di çi astê de ye?**

Derbarê vê mijarê de di nav civakê de jî fikareke berfireh heye, dibêjin pêvajo hatiye astengkirin. Lêbelê, ne rast e mirov bibêje ku pêvajo hatiye astengkirin, lê mixabin ew bi leza ku tê hêvîkirin pêşve naçe. Piştî Kongreya PKK'ê ya ji bo fesihkirina, hîn ji aliyê dewletê ve gaveke berbiçav nehatiye avêtin. Daxwazeke civakî ya xurt heye ku rojek berî rojekê ji aliyê dewletê ve gaveke berbiçav bê avêtin. Wekî Partiya DEM'ê, em hemû hewldanên xwe dikin da ku gavekê bavêjin. Me di dehan civîn û hevdîtinan de hewl da û em hîn jî hewl didin rave bikin ku divê siyaseta demokratîk di



pêkanîna vê daxwazê de rolekê bilîze. Di vê gavê de, ji hêla hemû aktorên siyasî û însiyatîfên sivîl ve bendewariyên xurt tên bilêvkirin. Bendewariyên herî bilind betalkirina qanûna qeyûman, destpêkirina komîsyonê bi lez û bez, guhertinên di qanûna înfazê de û azadiya Rêber Abdullah Ocalan e. Avakirina desteyekê zagonî di bin parlementoyê de gaveke girîng e û niha di rojeva me de ye. Divê ev komîsyon rojek berî rojekê bê avakirin da ku tevahiya civakê bihewîne û karekî bi bandor bike.

**- Heya niha ji aliyê hikûmeta dewleta Tirk çi gavên berbiçav ne hatine avêtin û erkên ku dikeve li ser milê hikûmeta Tirk çi ne?**

Ji banga Rêber Ocalan vir ve me hîn gavên berbiçav ji aliyê dewletê ve nedîtine. Kurtasî, heke em li ser aliyên ku şer dikin behsa lihevhatinê bikin, em ji wan aliyan hêvî dikin ku gavên berbiçav biavêjin. PKK'ê ev gav bi biryara fesih û çekberdanê avêt lê dûre gavên herî bingehîn ên ku ji dewletê dihatin hêvîkirin nehatin avêtin. Weke mînak; divê li gor qanûnên xwe tevbigere, ango biryarên DMME û Dadgeha Destûrî bi cih bîne û tavilê girtiyên dozên Kobanî û Geziyê bên berdan. Divê pergala qeyûman bê bidawîkirin û şaredarên hilbijartî vegerin ser erkên xwe, divê desteserkirina mafên girtiyan bi dawî bibe (şewitandina înfazê), divê rêziknameya înfazê ya ku hemû girtî li benda wê ne bê çêkirin, divê komîsyoneke bandorker di bin banê parlamentoyê de bê avakirin ku nûnertiya hemû pêkhateyên civakê bike û destûrdar be…

**- Piştî banga Rêber Apo PKK'ê kongreya xwe li dar xist û ji aliyê gelek derdor û saziyên navnetewî ve jî ev pêvajo erênî hat nirxandin. Erkên ku dikeve li ser milê raya giştî çi ne?**

Banga dîrokî ya "Aştî û Civaka Demokratîk" a ku Rêber Abdullah Ocalan di 27'ê Sibatê de diyar kir ne bangeke wisa bû ku tenê li ser pirsgirêka Kurd hat avakirin. Her çend me diyar kir ku çareseriya pirsgirêka Kurd bi rêya lihevhatinê mimkun e jî, me israr kir ku ev tenê bi rêya demokratîkbûnê mimkun e. Bi gotineke din, ev pêvajoyek e ku hemû dînamîkên civakê dihewîne. Avakirina aştiyê jî dikare bi avakirina civakeke demokratîk re paralel pêk were. Ji ber vê yekê, di civakîkirina aştiyê de berpirsyariya hemû gel, rêxistinên civaka sivîl, hemû kirdeyên siyasî, hemû jin û hwd. heye. Ev berpirsiyariyeke gelekî cidî ye. Ez dixwazim diyar bikim ku avakirina zimanê aştiyê dê nîşaneya niyet û vîna tevahiya civakê be. Ji bilî van hemû kirdeyên ku me behs kirin, ne tenê gelê Kurd, divê Tirk, Ereb, Ermenî, Çerkes, Asûrî û hemû gelên kevnar ên van axan jî dengê xwe ji bo aştî û çareseriyeke demokratîk bilind bikin. Divê êdî tenê wek temaşevan nebin, divê wekî kirdeyên çalak di pêşvebirina pêvajoyê de rolekê bigirin ser xwe. Weke me her tim gotiye; wekî Partiya DEMê, em amade ne ku hemû berpirsyariyan bigirin ser milê xwe da ku ev pêvajo li ser bingeha demokratîkbûn, hemwelatîbûna wekhev û aştiyê pêşve biçe. Heke em dixwazin siberoja hevpar a gelên Tirkiyeyê ava bikin; divê em wekî hemû rehên civakê rola xwe bilîzin da ku rê li ber vê pêvajoyê vekin. Herwiha dixwazim vê jî lê zêde bikim, aştiya ku dê li Tirkiyeyê bê damezrandin dê bandoreke erênî li ser tevahiya Rojhilata Navîn bike. Gavên ku dê ji bo demokratîkbûnê bên avêtin dê bandorên erênî li ser Sûriyeyê jî bikin. Erka me ye ku em ne tenê ji bo Tirkiyeyê, ji bo tevahiya herêma xwe civakîbûna aştiyê misoger bikin.

**- Ev hevdîtinên li gel wezîrê dadê ye Tirk û serokê parlementa Tirkiyeyê Nûman Kurtulmuş ti encam derket di mijara girtiyên siyasî û rewşa Rêber Apo çawa bê destgirtin?**

Ji destpêka pêvajoyê ve, gelek civîn bi berpirsên peywendîdar re çêbûn. Bi saya van hemû civînên ku me wekî Partiya DEM'ê li dar xistin, di warê bingeha goftûgo de pêşketineke pir giring çêbû. Goftûgoyên ku tên kirin, berdewam bi xwe encamek erênî ye. Em ê encamên berbiçav ên van civînan bibînin dema ku pêvajo pêşve diçe. Pêşveçûna herî girîng ew e ku hin girtiyên siyasî şandin cem Rêber Ocalan ku ew dikare bi rêk û pêk bi wan re bixebite. Rêber Ocalan bi komeke xebatê ya li Îmraliyê bi baldariyeke giran xebata xwe didomîne.

# KCK: Têkoşîna Şêx Seîd dayî îtiraza dîrokî ya li dijî înkarê ye

**Navenda Nûçeyan**

**Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê Şêx Seîd û hevalên wî bi bîr anî û got: "Gelê Kurd wê vê pêvajoyê bi serketî bi pêş bixe û têkoşîna ku ji serdema Şêx Seîd heta roja me bi bedelên mezin hatiye dayîn wê bi encam bibe û hesreta azadiyê bi dest bixe."**

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi boneya 100'emîn salvegera darvekirina Şêx Seîd û hevalên wî daxuyaniyek nivîskî da. Di daxuyaniyê de hate gotin ku Şêx Seîd ê ku di sala 1925'an de hate darvekirin, welatparêzekî hestyar, wêrek, zana û pêşengê gel bû.

Di daxuyaniya Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê de wiha hate gotin:

"Di ser darvekirina Şêx Seîd û hevalên wî yên ku di bîra gelê Kurd de cihekî kûr digirin 100 sal derbas bûn. Em wan her tim bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin. Di sedsaliya darvekirina wan de, em careke din Şêx Seîd û hevalên wî bi rêzdariyeke mezin bi bîr tînin û bejna xwe li ber bîranînên wan ên hêja ditewînin. Her wiha di şexsê wan de hemû şehîdên şoreş û demokrasiyê careke din bi minetdarî bi bîr tînin. Em dixwazin li vir diyar bikin ku xebata KNK'ê ya bi boneya sedsaliya darvekirina Şêx Seîd û hevalên wî pêk tîne pir watedar dibînin.

Şêx Seîd, wekî welatparêzekî hestyar, wêrek, zana û pêşengê gelê xwe, neheqiya li ser gelê Kurd qebûl nekir û li dijî înkara li ser gelê Kurd derket. Têkoşîna ku wî dayî, îtîrazeke dîrokî ya li dijî neheqî û înkara ku li ser gelê Kurd tê kirine. Her çiqasî têkoşîna wan bi komkujî û darvekirinên dewleta faşîst a qirker hatibe tepisandin jî, wan bi berxwedan, wêrekî û bêyî ku tawîzê ji doza xwe bidin çûn sêdarê û ev yek tevkariyeke mezin da kevneşopiya berxwedana Kurdistanê. Di encama têkoşîna Şêx Seîd û Seyît Rizayan de, li Kurdistanê berxwedan û têkoşîn ti carî kêm nebû û ev pêvajo heta derketina PKKê dom kir. Bi derketina Rêber Apo û PKK'ê ya li ser dika dîrokê re têkoşîna Şêx Seîd û hevalên wî ket qonaxeke dîrokî ya nû, şoreşa vejîna neteweyî pêk hat û siyaseta înkar û tinekirinê şikest.

Têkoşîna dîrokî ya gelê Kurd di çarçoveyek wisa de pêşketiye. Niha bi "Banga Aştî û Civaka Demokratîk" a dîrokî ku ji hêla Rêber Apo ve hatiye pêşxistin, ev



têkoşîn ketiye qonaxa avakirina azadiya gelê Kurd. Gelê Kurd wê vê pêvajoyê bi serketî pêş bixe û têkoşîna ku ji serdema Şêx Seîd heta roja me bi bedelên mezin hatiye dayîn wê bi encam bibe, hesreta azadiyê bi dest bixe û bendewariya Şêx Seîd ku dema ku ew dibirin darvekirinê ji bo rûyê neviyên xwe reş neke û têkoşînê bidomîne, wê pêk were. Bila gumana ti kesî nebe ku gelê Kurd wê vê yekê bi ser bixe. Bi vê bîr û baweriyê, em careke din di şexsê Şêx Seîd û hevalên wî de hemû şehîdên şoreş û demokrasiyê bi rêzdarî û minetdarî bi bîr tînin û soza ku me daye şehîdan dubare dikin."

# ‘Kevoka Aştiyê di nav şer de nikare bifire’

Banga Rêber Apo a “Aştî û civaka Demokratîk” ji bo tevahiya Rojhilata Navîn pêvajoyekî nû û dîrokî ye. Dayikên Gerîlayên Azadiyê diyar kirin ku dewleta Tirk ji bo aştiyê gav neavêtiye û gotin, “Kevoka Aştiyê di nav şer de nikare bifire.”

**Amara Baran/Qamişlo**

Piştî banga dîrokî a Rêber Apo, PKK’ê kongreya xwe ya 12’mîn li darxist û biryara dawîanîna li şerê çekdarî da. Dewleta Tirk herçiqas di gotinê de behsa aştiyê bike jî lê di pratîkê de li Heremên Parastina Medyayê êrîşên xwe bê navber didomîne.

**PKK’ê banga Rêber Apo weke manifesto qebûl kir**

Piştî banga dîrokî a Rêber Apo ku 27 ‘ê Sibatê de kiribû û lidarxistina 12’mîn Kogreya PKK’ê gelê kurd derbasî qonaxekî nû bû. Ev pêvajo bi banga aştî û civaka demokratîk re dest pê kir û ew banga dîrokî ji aliyê raya giştî û cihanê ve bi eleqeyek mezin hat pêşwazîkirin. Piştî banga dîrokî a Rêber Apo Komîteya navendî a PKK’ê piştî du rojan bi daxuyaniyekê niviskî helwesta xwe ji raya giştî re ragihgand ku ew banga Rêber Apo wekî manifestoya serdemê qebûl dikin û li gor rêgezên wê tevdigerin, PKK’ê got ku ji bo pêvajo hêsan bibe biryara agirbestê da.
PKK’ê li gor biryar û helwesta xwe tevgeriya û di navbera 5-7 gulanê de kongreya xwe lidar xist û bi wê re helwesta xwe ji raya giştî re parve kir. Kongreya ku 3 rojan dewam kir û di demekê ku şerê sêyemîn ê cîhanê dijwar bû ji nû ve teşedayîna Rojhilata Navîn ji bo ku bi lêz pêşbikeve perpektifa Rêber Apo di demekê ku şerê cihanê li Rojhilata Navîn berbelav dibû, hebûna gelê kurd di bin gefan de bû û azadî û îradeya wî dihat xesipkirin. Banga Rêber Apo ji bo Rojhilata Navîn bû hêvî.



**Yazî Hesen**

Derbarê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk û berdewamiya êrişên dewleta Tirk, dayîkên Gerîlayên Azadiya Kurdistanê ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Rêber Apo ji bo hebûn û nasnameya gelê Kurd têdikoşe’**

Yazî Hesen ku dayika du gerîlayan e anî ziman ku 27 sal in Rêber Apo li gireva Îmraliyê di nav çar dîwaran de dîl hatiye girtin û wiha domand: “Rêber Apo 27 sal in ji bo azadiya gelê Kurd û hebûn û nasnameya gelê Kurd li gireva îmraliyê tekoşîn da meşandin. Dewleta Tirk difikirî ku bi dîlgirtina Rêber Apo wê Tevgera Azadiyê û gelê Kurd tune bike, îro em dibînin ku ew çiqas tengav bûye ku heta xwe avêt ber lingê Rêber Apo. Em wek dayîkên gerîla daxwaziya azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dikin ku ev pêvajo bighêje serkeftinê, heta azadiya fîzîkî a Rêber Apo em ê li qadan bin. Bi saya fikrê azad ê Rêber Apo me hebûna û nasnameya xwe bi dest xistiye. Ez wek dayîka gerilla silavê xwe ji vir heta Îmraliyê ji Rêber Apo re dişeynim û soz didim ku heta dilopeke xwîn di laşê min de hebe, ez ê ji bo azadiya Rêber Apo berxwedanê bikim.”



**Neceh El Omer**

**‘PKK’ê 52 salan pêşengtî ji meşa azadiyê re kir’**

Yazî Hesen diyar kir ku PKK’ê 52 salan bê rawestandin ji bo azadiya gelê Kurd tekoşîn da meşandin û got, “Partiya Karkerên Kurdistanê piştî banga aştî û civaka demokratîk ku Rêber Apo kir, ji bo gelên Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê bû cihê heviyê, kongreya xwe ya 12’mîn li dar xist û dawî li şerê çekdarî anî. Ruxmê ku PKK’ê dawî li şerê çekdarî anî jî, lê dewleta Tirk bê rawestandin ji bo ku pêvajoya aştî û civaka demokratîk ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye destpêkirin berovajî bikin bi hemû hêz û teknîka xwe êrîşên qaden gerîla dikin da ku heremên gerîla dagir bikin û gerîla teslîm bigrin.”

**‘Bila êdî dayîkên gerîla negrîn’**

Yazî Hesen axaftina xwe wiha qedand: “Îro bi hezaran keç û xort ji bo Kurdistaneke azad canê xwe kirin mertal û bi xwîna xwe dîrok neqişandin. Ji bo ku dayîk êdî negrîn pêwîst e dewleta Tirk gav bavêje û şerê heyî bide sekinandin. Em edî şer naxwazin pêwîstiya me bi aştiyê heye. Banga me ji bo hemû kesên ku dibijin em parastina mafê mirovan dikin ku li hemberê vî şerî rabin, nehêlin ku êdî dayikên gerîla û yên eskera bigrîn. Em ne aşiqê çek û şerin, ji bo ku em xwe biparêzin mecbûrin ku şer jî bikin, dewleta Tirk ji aliyekî ve dibêje ez destê aştiyê dirêj dikim, li aliyê din jî bi çekên qedexekirî û bi balafiran êrîş dike, ka aşitî ka edalet.”

**‘Kevoka Aştiyê di nav şer de nikare bifire’**

Neceh El Omer ku dayika gerîlayekî ye diyar kir ku jî dewleta Tirk li gor pêvajoya aştî û civaka demokratîk tevnagere, agirbestê binpê dike û wiha anî ziman: “Dewleta Tirk herçiqas bi devkî behsa aşitiyê bike jî li qadên gerîla êrîşekî îmha û înkarê daye destpêkirin. Em wek dayîkên dilşewat bang dikin ku edî dawî li wî şerê bînin, kevoka aştiyê nikare di nav şer de bifirê, ji bo ku kevok bi awayek azad bifirê pêwîst e şer bê sekinandin. Me îro bi hezaran keç û xort şehîd dane em naxwazin ji vir şûnde şehîdan bidin.”



## Li Amedê Konferansek watedar

**Ahmet Aktaş**

Di çarçova pêvajoya Aştî Û Cıvaka Demokratık de, ji aliyê KMM(IHD) ve, li Amedê konferansek 2 rojan a gihandina cem hev a malbatên şehîdên Tirkiyê û Kurdistanê pêk hat(21-22 Heziran 2025).
Giringî û watedariya vê konferansê, mirov dikare di kesatiya du malbatan de, bi zelalî bibîne.
Yek; ji Tirkiyê malbata Eren Bulbul, dudu; ji Kurdistanê malbata Ugur kaymaz bû.
Ugur Kaymaz, di 21’ê Mijdara 2004’an de li Qosera Mêrdînê ji aliyê polîsan ve hatibû şehîd kirin.
Eren Bulbul, di 18’ Tebaxa 2017’an de li Maçka Trabzonê di şerê navbera leşker û gerilla da şehîd ketibû.
Ji xwe di peyamên dayikan de jî mirov aşkere dibîne ku çendîn li dijî şer û cengêne, belê berovajî alîgirên aştiyê ne.
Dayîka Erenê 15 salî Ayşe Bulbul wisa dibêje: Ez silavê li we hemû beşdaran dikim û jiber tenduristiyê nikarim beşdarî civîna we bibim xemgînim. Ez piştgriya aştîyê dikim. Kurê min şehîd bû, bila êdî dilê ti dayikên din ne êşe. Di bedena kurê min de 17 gule derket…min xwest van hestên xwe bigihênim we. Ez hewldanên we gelek bi rûmet dibînim. Ez razî nabim ku ti dayikên din, ji ewladê xwe cuda bibin. Ma ez aştiyê ne parêzim lê çibikim?..
Dayîka Ugur Makbule Kaymaz jî wisa dibêje: Ji ber pirsgrêkên tenduristiyê ez nikarim beşdarî konferansê bibim xemgînim. Ji bo keda we ya hêja ya aştiyê mala we ava be. Kurê min hîn 12 salî bû, li gel bavê xwe bi 13 guleyan şehîd ketin. Ewqas sal in ez, weke dayîkek bargiran vê êşê dikişînim. Ji bo ku ev êş nekeve dilê ti dayikên din ez li vira me. Ji bo em rêyên bihevrejiyanek di nava aştiyê de bibînin li vira me. Êdî em naxwazin, ne li Kurdistanê, ne li Tirkiyê û ne li ti deverên din zaro werin kuştin. Me ewladên xwe ji dest dan belê em naxwazin hêviyên xwe ji dest bidin. Êdî em hêsrê çavan naxwazin, belê em edaletê, wekheviyê û aştiyê dixwazin…
Di vê mijarê de divê du xal bi zelalî were naskirin, yek; sedemê vî şerê û her wiha gunehbarê van kuştin û şehadetan dewlet e, dudu; di van her du peyamên pîroz ên her du dayikan de jî pir zelal tê dîtin ku, ji kîjan alî an ji kîjan gelî dibe bila bibe, yên herî dilêş û kezebşewitî dayik in û va ye ew bixwe çendîn li dijî şer in, belê çendîn alîgirên aştî û jiyana hevparin, li ber çava ne!
Her wiha carek din, pir zelal xuya dibe bang û pêvajoyên çareseriyên ku Rêber APO pêşkêş dikin, çendîn rastin û lewma divê herkes bi dilsozî lê xwedî derkevin û bi çalakiyên wisa corbecor destê Rêberê xwe xurtir bikin, da kû zûtir ev pêvajo bigihêje armancên xwe yên bingehîn.
Jiber ku dudilî û fêlbaziyên dewletê ticarê xelas nabin, heke ne gelek hewcedar û naçar bin, nêzî aştî û jiyana hevpar û wekhev nabin.
Lewma divê em ên dilêş û kezebperitiyên bi hesreta azadiyê û jiyana azad a wekhev, xemsariya nekin, bi lez bibin têkoşerên vê pevajoya hêja û çalakiyên mîna vê Konferansê.

# Dewleta Tirk û pergala şerê taybet

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Endamê Meclisa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Ebdilxenî Oso diyar kir ku Rêber Apo û PKK bi erkê xwe yên dîrokî rabûn û niha dem hatiye ku dewleta Tirk gavan biavêje û gelê kurd qebûl bike.**

Piştî şerê cîhanê yê duymîn, hêzên desthilatdar ji bo berjewendiyên xwe gelê Kurd kirin qurban, li her çar perçeyên Kurdistanê bêdengî û xeweke giran hebû. Herwiha gelê kurd bêhêviyek mezin jiyan dikirin. Tîşta ku hatibû serê wan weke qedera xwe qebûl kiribûn. Li Bakurê Kurdistanê û Tirkiye bi giştî qeyrana aborî, siyasî û civakî gihiştibûn asteke bilind. Li hemberî vê rewşê bi giştî, di 27’ê mijdara 1978’an de damezrandina PKK’ê bi fermî hat ragihandin. Tevî êrişên giran û şerê taybet ku dewleta Tirk dida meşandin, her ku dem derbas bû PKK’ê belav bû û serkeftinên mezin bi dest dixist. Gelê kurd ji qirkirinê rizgar kir û têkoşîna azadiyê gihand lûtkeyê. Herî dawî li ser banga dîrokî ya Rêber Apo PKK’ê kongreya xwe ya 12’an lidar xist û bi erkê xwe yê dîrokî rabû. Lê heta niha niha jî, êriş, şerê taybet û zimanê şer yê dewleta Tirk dewam dike.
Derbarê mijarê endamê Meclisa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Ebdilxenî Oso ji Rojnameya me re axivî.

**‘Ji bo naskirina PKK’ê pêwîste em li dîroka wê vegerin’**


Ebdilxanî Oso destnîşan kir ku eger mirov bixwaze cewhera banga Rêber Apo û biryara PKK’ê nas bike, pêwîste li dîroka PKK’ê vegere û wiha got: “Eger ku PKK’ê nehata avakirin wê gelê Kurd bi giştî qir biba. Pêvajoya îdolojîk di salên 1973 – 1978’ an de di nava PKK’ê de dest pê kir û piştre di sala 1978’ an de PKK’ê hat ragihandin.Di 15’ê Tebaxa 1984’an de PKK’ê dest bi şerê çekdarî kir. PKK’ê dest bi şerê çekdarî kir ji bo ku nasname û hebûna gelê Kurd biparêze. Ev pêvajo heya sala 1993’an meşiya û piştî wê 9’ caran ji aliyê PKK’ê ve agirbest hat ragihand, lê dewleta Tirk êrişên xwe dewam kirin. Lê piştî banga Rêber Apo ya ‘Aştî û Civaka demokratîk’ PKK’ê agirbest ragihand û kongreya xwe ya 12’an lidar xist û tê de banga Rêber Apo bersivand. Banga Rêber Apo ji bo PKK’ê û tevahî gelê kurd û Kurdistanê de bi rengekî erênî hat pêşwazî kirin. Lê dewleta Tirk heya niha tu gav neavêtine, ji ber ku hin hêz di hundirê dewleta Tirkiyê de hene naxwazin ev pêvajo bi ser keve.”

**‘Gavên pêşî li ser milê dewleta Tirk e’**

Oso diyar kir ku niha dora dewleta Tirk e ku gavan biavêje û wiha domand: “Rêber Apo û PKK’ê erkê li ser milên xwe pêk anîn û gav avêtin, niha gavên pêşî divê dewleta Tirk bavêje. Ev pêvajo pêwîst e ji her du aliyan ve bê pêşxistin, ne tenê ji milê PKK’ê ve, lê divê ji milê dewleta Tirk ve jî bê pêşxistin. Dewleta Tirk pêwîst e zagonên xwe biguherîne û gelê Kurd qebûl bike. Di hundirê hikumeta Tirkiyê de yê ku bi vê pêvajoyê rabûye û dixwaze pêk were MHP’ê ye û em dîroka MHP’ê a ku çawa êrîş li dijî gelê Kurd û tevahî gelan daye meşandin dizanin, lê siyaset li cîhanê tê guhertin ev pêvajoya dawî a piştî 2020’an guhertinek di cîhanê de çêkir û rewşa Tirkiyê wê çawa be hemû tê diyarkirin û dewleta Tirk baş dizane ku dem ne dema berê ya 1923’an e, ne dema ku dewleta qewmî hat avakirin û piştgiriya dewleta Tirk dikirin ku komkujiya bi serê gelê Kurd û gelên herêmê, bike. Eger dewleta Tirk bi rengekî rast û dirist bifikire wê berjewendiya Tirkiyê û ya gelê Kurd bi hev re bide meşandin, ji ber ku eger dewleta Tirk xwe neguherîne wê ew dewlet bê guhertin, ji bo wê jî divê di van deman de dewleta Tirk gavên erênî bavêje û guhertinan di zagonên xwe de çêbike.”

**’Heta niha zimanê şer yê çapemeniya Tirk nihatiye guhertin’**

Endamê Meclîsa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Ebdilxenî Oso axaftina xwe wiha qedand: “Dewleta Tirk di vê desthilatdariya xwe de a ku ji 1923’an



de û heya roja îro hertim şerê taybet dimeşîne, bi riya wê dixwaze bandorê li ser tevahî civakê bike û wan bixe bin serweriya xwe. Dewleta Tirk di sala 1960’ î de derbeya leşkerî çekir, 1971’an de pilanek din çekir û heya roja îro dewleta Tirk bi şerê taybet dixwaze desthilatdariya xwe bide meşandin. Dewleta Tirk di destpêka rabûna xwe de di sala 1919 – 1923’an de Kemal Ateturk civîn ji gel re çekir û got em birayê hevin û em ê bi hevre kar û xebat bikin, eger ev gotin bihata meşandin wê rewşa Tirkiyê ne wisa ba lê armanca dewleta Tirk ku bandor û desthilatdariya xwe li ser gel bide meşandin û bi riya şerê taybet vê pêvajoya xwe ya desthilatdariyê bide meşandin, heya roja îro jî siyasetên wan wiha ne.
Armanca dewleta Tirk ji şerê taybet ew e ku hertim bi hêz be û xwena vegerandina împeretoriya xwe pêk bîne. Armanca çapameniya Tirk ku her tiştî bixe bin xizmeta xwe û serweriyê li ser tevahî gelan bike.”



# Li hemberî mekanîzma çapemeniya dijber; Ragihandina Azad

Hevserokê Daîreya Ragihandinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ciwan Mele Îbrahîm diyar kir ku tecrûbe û pêvajoyekî nû ya ragihandinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi Şoreşa 19'ê Tîrmehê re hat destpêkirin, ev tecrûbe di aliyê pisportiyê de lewaziyên xwe hebû, lê li bermaberî mekanîzma çapemeniya dijber heta astekî xwedî rol e.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê rola ragihandinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Hevserokê Daîreya Ragihandinê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ciwan Mele Îbrahîm bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Rewş û rola saziyên ragihandinê û rojnamevanan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di çi astê de ne?**

Rêjeya saziyên rojnamevanî û rojnamevanên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixebitin? asta azadbûna ragihandinê û asta ku serbest xebatkirina rojnamevanan di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, tu wê zelal nîşan dide. Îro li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nêzî 90 saziyên ragihandinê dixebitin, di nav wan de yên herî pêşeyî û navnetewî hene, li kêlek wê zêdeyî hezar kesî/ê di van saziyan de xebat dikin. Ev jî li gorî erdnîgariyeke wiha biçûk, rêjeyekî pir bilind û baş e.
Em nabêjin ji sedî sed ragihandin heyî ya niha dikare bibe bersiv ji bo rewşên ku vê gavê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Sûriyê, Rojhilata Navîn û tevahî cîhan tê re derbas dibe. Lê rolekî xwe ya girîng dilîz e. Wekî ku tê zanîn piştî Şoreşa 19’ê Tîrmehê gavên pir mezin di asta rojnamevanî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin avêtin. Piştî rûxandina rejîma Baas û herwiha rewşên ku vê gavê li Rojhilata Navîn tevahî rû didin, em dibînin ku rojnamevanên me dixwazin hîn bêtir pêşketinekê ava bikin.
Dijîtiya ku li ser gel û şoreşê çê dibe, heta astekê rojnamevanên me dikarîn bibin deng û rengê gel û vê herêmê, heta dikarin bêjin ew bûn wek nûnerên devkî yên herêmê ji bû tevahî cîhanê. Tevî kêmasiyên ku derketine, lê ema rolekî wiha girîng, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê vê gavê tê lîskandin, dibe ku asta pisporiyê kêmbe jî, lê ji demên berê baştire. Ji ber ku her diçe pisprortiya ragihandinî pêş dikeve. Ji bo wê em dikarin bibêjin rewşekî rojnamevanan heta astekî ku tê qebûlkirin heye, lê kêmasiyên xwe jî hene ku hîna tam nebûye bersiv ji şoreş, gel



û bûyerên ku niha têne qewamdin û kêmbûyîneke xwe heye, lê dîsa jî hewldanên pir mezin li hemberî reşkirin û tarîkirina xebatên ku li vê herêmê tên kirin, hene û gelek caran rojnamevanên me dikarin dengê gel di asta navdewletî de, bighînin.
Wekî beriya niha jî min anî ziman tecrûbe û pêvajoyekî nû ya ragihandinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi Şoreşa 19’ê Tîrmehê re hat destpêkirin. Ev tecrûbe heta astekî di aliyê pisportiyê de lewaztiyên xwe hebû. Lê li bermaberî mekanîzma çapemeniyê ya dijber bi taybet ên dewletên desthilatdar û dagirker de, bi rastî jî hewldanekî mezin a Ragihandina Azad hebû ku dikarîbûn van pênase û dîwarên ji batonê hatibûn avakirin, bişkînin. Herwiha rojnamevanên heyî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikarîn heqîqetê bidin pêş, di gelek deveran de jî ew propaganda û şerê taybet ê ku li dijî herêmê dihat meşandin ji bo raya giştî, vala derxînin.

**Ragihandina Azad wê çawa bibe sîwana giştî ragihandina li Sûriyê? Û çawa dikare ezmûna demokratîk derbasî Sûriyê bike?**

Di tevahiya Sûriyê û cîhanê giştî de ragihandinekî ku tu bêje serbixwe tuneye. Lê ema pênûs û kamîreyên azad yên xurt hene. Lê di deverên dîtir ên Sûriyê de azadî nehatiye peydakirin, yan tu bi desthilatdariyê re be yan tu nikare bixebite, ev rêje li Sûriyê heta astekî li pêşe û hîna tam ev yek nihatiye şikenandin. Ji bo wê wekî ku çawa şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê vê gavê nimûneye ji bo tevahî Sûriyê û tecrûbeya Rêveberiya Xweser jî tekane çareserkirina pirsgirêka Sûriyê ye, di asta rojnamevanî de jî rêjeya azadiya rojnamevanî ya heyî tevî kêm û kurtiyên xwe hene jî, lê heta astekî bilind dikare bibe bersiv ji



bo rewşên tevahî Sûriyê. Di heman demê de dikare bibe xwedî heman helweset û xwedan rêbazekî ku karîbe “Çapemeniya Azad” di tevahî Sûriyê de li pêş bixîne. Wekî ku berî niha jî min gotibû; tevî kêmasiyên di pisporiya meselkî de, lê di aliyê ramyarî, pênaseya azad û ya rast ku heqîqeta heyî bidin pêş, dikare bibe sîwan û nimûne ji bo pêşxistina ragihandin û rojnamevaniyê li tevahî Sûriyê.

**Astengiyên ku li pêşiya ragihandina dengê civak û heqîqetê derdikeve çi ne û çawa dikarin van astengiyan derbas bikin?**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hîna jî di asta pisporiyê de lewazî derdikevin û pêdiviyên me hene ku di vî alî de em xwe li pêş bixin. Ji ber gelek caran em nikarin bibin bersiv ji bo liv û tevgera ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêdibe. Lewma pêwîstiyeke hîn bêtir di lêhûrbûna di derbarê Ragihandina Azad çi ye û gerek em çawa Ragihandinekî Azad li pêş bixînin, di vî alî de pêwîstiyên me bi perwerdeyê hene. Astengiya dîtir ew e ku li vê herêmê bi taybet wekî ku çawa heta demekî dirêj dorpêçekî siyasî û aborî hebû, dorpêçekî rojnamevanî jî hebû, wekî likeyekî reş li ser herêmê hebû, ji bo rastî û heqîqetên ku li vê herêmê tên jiyankirin dernekevin derve, ji bo wê di asta rojnamevanî de jî tarîtiyeke bi vî rengî hebû. Îro hêdî hêdî ev taritî dişke û dîwarê desthilatdariyê tê hilweşandin. Lê dema em pêşketineke berbiçav di asta pisportiyê de çê bikin, em ê karibin hîn bêtir heqîqeta ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê jiyankirin, pêvajoya ku tê meşandin û destkeftiyên ku gel bidest xistin û îro li pêş dikevin, bidin pêş, wê demê birastî em ê bibin bersiv. Ev her du mijar mijarên herî ku vê gavê zehmetî tê de tên kişandin, dema em van derbas bikin, em ê gavên mezin bavêjin.

**Di rewşa heyî ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Sûriyê û giştî cîhanê de çi ji raginandinê tê xwestin?**

Vê gavê hewcedariyeke me berî her tiştî bi ragihandinekî welatparêz heye. Ragihandina welatparêz ew ragihandina ku bi rastî jî bikarîbe vî gelî, vê herêmê ji taritiyê derbixe. Bi çi derbixe jî? Heqîqet nîşandayîna vî gelî û analîzkirina rewşên heyî bi awayekî vekirî, ji gel re îfadekirina vê na erkekî ragihandinê ye. Ji bo wê pêwîstiya me vê gavê bi ragihandinekî welatparêz heye ku karîbe gel li ser rastî û heqîqeta şoreşa wî perwerede bike, hem li bermaberî êrişên ku têne kirin bi rêya karmîreya xwe, nûçeyên ku têne amadekirin û projeyên ku têne pêşxistin, bisekine. Pêwîstiya dîtir ragihandinekî biwijdan lazime, ragihandinekî ku birastî ji bin sîwana desthilatdariyê û dagirkeriyê derkeve, ev jî ji bo ragihandina navnetewî jî derbasdare. Ragihandina ku îro li cîhanê tê kirin, ragihandinekî di aliyê siyasî de li pêşe. Ji ber wê heger em bixwazin cîhanekî aştiyane ava bikin û di Rojhilateke Navînî azad ku her kes tê de bi nasnameya xwe jiyan bike, gereke em saziyên ragihandinê ji bin sîwana van hêzên dagirker û hegemonîk derxînin, di vî alî de jî rastiyê bidin pêş, nebin amûr di destê van proje û xerabiyên hêzên hegemonîk ku dixwazin bikin. Bi rastî jî pêwîstiya me bi ragihandinekî bi vî awayî heye ku bikaribin di rojên pêş de bibin deng û rengê gelê xwe.

FENER



## Netewperestî Li Yek Qadê Bi Dawî Nabe!

**Idrîs Henan**

Bi ezmûna aloziya li Sûriyê re, carek din tekez bû ku; bi dijatiya ji desthilatdariya Baas û bi hilweşandina wê re, fanatîzma netewperest û ruhê emperyal a netew dewlet xilas nebûye. Ew dijatiya bi salan e hewl hatiye dayîn ku weke hişmendî were rûnişkandin û ketina rejîma Baas weke qedandina sîstema faşîzma netewperest were pênasekirin, nekariye pratîze bibe û ne jî kariye bibe malê raya giştî ya civakê.
Sîstema ku xwe li gelek navendan bi cih kiribe, bi têkçûna yek navendê re bi dawî nabe. Divê li hemberî hemû navendan, hemwext serî were hildan û berxwedanek şoreşgerî ya birêkûpêk were organîzekirin. Ji lew re jî, dijatiya ji desthilatiya Esad û Baas re, nekariye veguhere berxwedana li hemberî sîstema emperyal a netewperestiyê û ne jî bûye mala tevayî gelên Sûriyê. Aliyek din ve jî bawerî bi rêbaz û metodên têkoşîna di çarçoveya rikberiya li ser desthilatdariyê hatiye meşandin de çênebûye. Ev fikirandin ji bo Tirkiyê, Îraq û Îran jî derbasdar e. Ango bi ketina Sedam û Esad re navenda sîstema ku netew dewlet pala xwe didiyê hilneweşiyaye.
Niha em çavekî li bûyerên îro bixin û pir dûr neçin. Her kes dizane ku Îran weke hemtayên xwe, dewletek fanatîk a olî ye ku sîstema xwe li ser bingeha Îslamê ava kiriye. Lê ger mirov li sazûmanî û rêxistinbûna wê jî binêre, dê têbigihêje ku ne dûrî pergala cîhanî ya sermayedar û cudayî wê jî nîne. Berovajî; bi hêz girêdayî wê ye. Lê ji ber nakokiyên wê bi navenda hegemonîk re û azweriyên wê yê hegemonbûyîna herêmî, weke dijber xuya dike û bi vî awayî jî hinek lihevkirin û blokên xwe, di bin sernavên cuda cuda de dane avakirin. Nêzîkatî û varsyonên bi vî rengî yên desthilatdariyên netew dewlet ku bi maskên cihêreng hatine nixumandin, serê însanan tevlihev dike, xwendin û analîza rûdan û pêşketinan ji rê derdixe. Yanê eger mirov koka van sîsteman baş venekolandibe, bê guman, dê dahûrandina binyada van sîstemên fanatîk jî şaş be. Lew re divê nihêrandin û xwendin analîtîk ne li gorî dil û cergan metafîzîk be.
Berjewendî şiklê têkîlî û stratejiyan diyar dike. Taybetmendî û naveroka têkîliyan jî şikil dide girîngiya berjewendiyan. Ev hemû jî bandoreke rasterast li şêweyên avakirina civakê dikin û fîgura wê ya pêşerojê diyar dikin. Ji ber vê jî, eger sîstema civakê demokratîk nebe, bi serê xwe dibe belayek û xwezaya civakê di oxira berjewendiya desthilatê de serûbin hev dike û rê li ber şîdet, kuştin, talanî, şer û pevçûnan vedike. Bi gotinek din; ji otorîteya heyî re dibe zemînek ceribandinê. Ev yek girîngiya xwe li Rohilata Navîn gelek ber bi çav e. Ji ber ku qadeke pirrengî û gelên wê bi hezarê salan di nav hev de dijîn. Argumanên olî û mezhebî nikarin nasnameya vê qadê ya çandî û etnîkî ji hev cuda bikin. Ancax siyaseta demokratîk a ku li hemû qadan li hemberî navendên hegemoniyê li ber xwe dide, pêkan be ku bi civakê bide qezenckirin. Ne wisa be, dê hemû qad û navendên cuda li gorî berjewendiya sîstemên fanatîk, ne li gorî demokrasî û daxwazên gelan bin. Ji bona vê jî, hembêzkirina projeya demokratîk a edalet, wekhevî û biratiya gelan, tekane rêya serfirazî, azadî û serxwebûnê ye. Ne ev rêbaza têkoşînê be, dê berxwedanî li yek qadê kilîtkirî be û fanatîzma netewperest bi dawî nabe.